

ROVIYÊ STEMKAR Roviyeke hebû pir ziyan dida derdore, ji ber wê her kes jê direviya. Rojekê hiziri û ji xwe re got: "Ger ez kiraseki oli li xwe nekim, bi wi rengi nekevîm tevgerê, ez ê li van deran ji birçîna bimirim, ji ber ku her kesi ez nas kirime Rovi: "Ez ê rabîm biçim hecê, Bixwim mirîşka Xecê, Bikim hîle û fenda Heta herime gunda." Rabû şaşîkek da serê xwe, tizbiyek kir stûyê xwe û xwe berda nava gundekî. ku mirîşk diçerin, Li ser sergo dinêrin, Rovi giha dehma wan, Silav kir ser dikê wan. Dik silava wi veda, Hema hêdika çik da. Dit Seyid tu i ser van sergoyan gi dik were an leie leck Çiye Rovi: "Seyda tu li ser van sergoyan çi dikî? Were em herin mala Xweda, tu kesekî melayî." Dik: "Pir me dine te xwarin, Ji hingî ve şiyar in." Rovi hat û hûrhûrî, Tizbe hejand korkorî. "Ez bûme gunehkar, Lê min tobeye ji fêlên par." Bi vî awayî dikê feqîr xapand û bi dik re ketin re. Hinekî ji gund derketin, ditin kewekî dengxweş dixwine. Rovi nêzik bû û silav kir. Kew silava wî veda, Hema hêdika fir da. Rovi ji banî kirê: "Erê wa feqî çima tu dîbî şeqî? Were va seydayê te bi min re ye, em herin hecê." Dema kew dit ku rovî û dik bi hev re ne, bawerîya wi hat, ew jî ket rex wan û rêwîtiya xwe berdewam kirin. Giha ber ava çem, nêrîn ordekek li wê derê ye. Rovi silav li ordeke kir, ordeke silava wî veda û xwe berda nava avê. Rovi: "Seyîd! Tu ji nîsra resûlî Li van deran çi dikî, bêxwedî, Were em herin Medîne, Da tu cidê xwe bibîne." Wê jî bawer kir û ket rex wan. Li wan bû êvar. Rovi: "Em tobedar in, divê em bikevin kuneke da ku telayên din me nexwin." Geriyan kunek ditin û her çar bi hev re ketin kunê Rovi "Ez bûme gunehkar. Ez ê bibim nobedar". Rovi rabû nobet girt, Derê kunê taze girt. Nivê şevê dibore, Diko rabû diqire. Rovi: "Ev çi ye, ne wextê nimêjê ye, ev çi oldariya sexte ye tu dikî?" Dik: "Ne sexte ye." Rovi li feqe zivirî: "Feqe bêje, weke min gotî, yan weke mela gotî?" Feqîrê feqe, li çavên rovi nêrî û tirs ket dilê wî û got. "Weke te gotî, ne weke mela gotî." Rovi serê dik jê kir. Li paşîya kunê kir. Ketiye serê siharê, Kew jî rabû diqebe, Ew ji xwe re dixwine Ji Quran û Yasinê. Rovi: "Çi adet, Quranê dixwine xelet." Feqe: "Ne xelet e." Rovi li ordeke zivirî: "Seyid weke min gotî yan weke feqe gotî?" Seyid: "Weke te gotî, ne weke feqe gotî." Rovi serê feqe jî jê kir, Li dawîya kunê kir, Ma seyîd û ma rovi, Seyîd ji tîrsa nalivî. Rovi: "Erê seyîd tu dibêjî ez seyîd im, ka eslê te, ka secera te, çima tu ev qas derewan dikî?" Seyid: "Hecî tu pir başî, Lê xeber belaşî, Min hebû birayekî biçûktir, Eslê min wî bi xwe re bir, Ger tu bixwazî ez ê, Herim bînim birayê xwe, Du şahid û eslê xwe." Rovi tema bû û got: "Baş e here bîne, Lê belê pir nemîne." Rovi derê kunê vekir, seyîd derket ji ".derve û got: "Hecî ser çava, Rebî mala te ava